

TÎR Û ARMANC
gotarên rexneyî
li ser edebiyata kurdî ya modern

TÎR Û ARMANC
gotarên rexneyî
li ser edebiyata kurdî ya modern

Amadekar: Remezan ALAN & Ergin ÖPENGİN

Weşanên Peywend: 14 | raman: 4
Edîtorên Kitêbê: Remezan Alan & Ergin Öpengin
Berg: Aysel Kazıcı Özalp
Rûpelsazî: Peywend

Sertifika No: 28947
ISBN: 978-605-85387-4-0

© Weşanên Peywend
Çapa Yekem: Peywend, 2014, Stenbol

Çap:
Kayhan Matbaacılık
Davutpaşa Cad. Güven San. Sit.
C Blok No: 244 Topkapı / İstanbul
Tel: 0212 576 00 66

PEYWEND

Kuloğlu Mah. Sadri Alışık Sk.
No: 16/51 Beyoğlu İSTANBUL
Tel: 0532 176 93 64
E-Mail: peywend-@hotmail.com
www.peywend.com
www.facebook.com/wesanxaneyapeywend

TÎR Û ARMANC
gotarên rexneyî
li ser edebiyata kurdî ya modern

AMADEKAR
Remezan ALAN & Ergin ÖPENGİN

BIYOGRAFIYA NIVÎSKARAN

Fexriya Adsay lîsansa xwe li Enqereyê li Zankoya Rojhilata Navîn ya Teknîkî (ODTÛ) di beşa dîrokê de qedand. Li Zankoya Dicleyê di beşa sosyolojiyê de li ser êzidiyan û li Zankoya Mardin Artukluyê di beşa Ziman û Çanda Kurdî de li ser romana dîrokî ya kurdî du master temam kirin. Ji îngilîzî bo tirkî û kurdî gelek berhem wergerandine. Ji serê 2014ê ve, di edîtoriya kovarên kurdî yên lêkolînî *Wêje û Rexne* û *Zaremayê* de cih digire. Xebatên wê yên akademîk li ser edebiyata kurdî ya modern û rexneya edebî ne. Niha li Diyarbekirê mamostetiya zimanê îngilîzî dike.

Îlyas Akman ji sala 2009an ve li Zankoya Mardin Artukluyê di beşa Ziman û Edebiyata Tirkî de wek asîstan dixebite û lêkolînên doktoraya xwe ya li ser edebiyata tirkî ya modern bi rê ve dibe. Elaqeya wî ya akademîk li ser teoriya postkolonyal, edebiyata berxwedanê, têkiliya huner û siyasetê û teoriyên edebiyata modern e. Niha li Zankoya Columbiayê wek lêkolêrê mêvan xebatên xwe yên zanistî didomîne.

Remezan Alan ji beşa edebiyat û zimanê tirkî ya Zankoya Dicleyê mezûn bû. Ji sala 2012an ve li Enstitûya Zimanên Zindî ya Zankoya Mardin Artukluyê di beşa Ziman û Çanda Kurdî de mamoste ye. Bawernameya xwe ya mastirê li ser edebiyata kurdî ya modern li sala 2012an ji heman beşê wergirt. Xebatên wî yên akademîk li ser teoriya edebiyatê, romana kurdî, rexneya edebî, vegotinasî, edebiyata berawirdî û pêvajoyên modernbûnê ne. Heta niha romanek bi navê *Saturn*, pirtûkeke gotarên rexneyî li ser edebiyata kurdî bi navê *Bendname* û monografiyek bi navê *Folklor û Roman* (Peywend 2013) çap kirine. Halê hazir li Zankoya Xaxoyê xwendekarê doktorayê ye.

Haşim Ehmedzade (Hashem Ahmedzadeh) doktoraya xwe ji Zankoya Uppsala wergirt (2003). Ji 2005an heta 2012an li Zankoya Exeter di Enstitûya Lêkolînên Erebî û Îslamî di Navenda Lêkolînên Kurdî de wek hîndekar û doçent xebitî. Sala 2013an li Enstitûya Lêkolîn û Geşedanê li Hewlêrê wek vekoler dest bi kar kir. Xebatên wî zêdetir li ser babetên edebiyata berawirdî, avakirina nasnameyê di edebiyatê de û modernîte û encamên wê di çarçoveya post-kolonyal de ne. Heta niha, ji bilî kitêba *Nation and Novel: A Study of Persian and Kurdish Narrative Discourse* [Netewe û Roman: Xebatek li ser Rabêja Edebî ya Farsî û Kurdî] (Uppsala, 2003), gelek gotarên akademîk li ser edebiyat û siyaseta kurdî ya modern belav kirine.

Zülküf Ergün di sala 2001ê de ji beşa ziman û edebiyata tirkî ya Zankoya Dicleyê mezûn bû. Bawernameya xwe ya masterê sala 2012an ji beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Zankoya Mardin Artukluyê wergirt. Di heman beşê de dersên edebiyata nû û rêzimana soranî û kurmancî dide. Hin gotar û xebatên wî bi navê Zilkîf Xweşhêvî di kovara *Nûbiharê* de hatine weşandin û *Rêzimana Kurdî* (Nûbihar 2013) ya Qanatê Kurdo wergerandiye ser kurmancî. Bi navê *Bajar, Edebiyat û Cizîra Botan* xebateke wî li ber çapê ye. Niha li Zankoya Zaxoyê li ser xwendina xwe ya doktorayê berdewam e.

Özlem Belçim Galip doktoraya xwe ya di warê lêkolînên kurdî de ji Zankoya Exeterê wergirt (2013). Ji sala 2013an ve li Peymangeha Şerqiyatê ya zankoya Oxfordê wek lêkolêr û hindekar dixebite. Lêkolînên wê bi giştî li ser romana kurdî, vegotina edebî, koçberî û xebatên diasporayê ne. Yek ji nivîskarên kitêba *Kürt Romanı Okuma Kılavuzu* [Rêbera Xwendina Romana Kurdî] (Sel, 2010) ye. Lêkolînên wê yên heyamên dawî li ser romanên kurdî yên Ermenistana dewra Sovyetê ne.

Ergin Öpengin doktoraya xwe ya di warê zimannasiya giştî de ji Zankoya Sorbonne Nouvelle û Zankoya Bambergê wergirt (2013). Li Zankoya Bambergê wek vekolêrê post-doktorayê dixebite. Elaqeya wî ya akademîk bê-tir li ser dokumantasyon û teswîra binyadî ya zar û zimanên kurdî û îranî ye. Tevî çendîn gotarên akademîk li ser zimannasiya kurdî, nivîserê kitêba *Rewşa Kurdî ya Sosyolinguîstîk li Tirkîyeyê* (Avesta, 2011) û wergêrê çendîn kitêban e. Xebatên wî yên heyamên dawî li ser tarîxa zimanên kurdî û îranî, plansaziya zimanî û wergera kurdî ya metnên zanistên civakî û mirovî ne.

Clémence Scalbert-Yücel doktoraya xwe ji Zankoya Paris IV-La Sorbonne û INALCOyê wergirt (2005). Ji sala 2007an ve, li Zankoya Exeter, di Enstîtûya Lêkolînên Erebbî û Îslamî di Navenda Lêkolînên Kurdî de, mamoste û vekolêr e. Xebatên wê bê-tir li ser çalakgeriya etnîk û afirandin û berhemhênana çandî ye di peywenda dubendiyên qewmî de. Ji bilî belavkirina hejmareke gotarên akademîk, jimareyeke taybet a kovara *Nationalities Papers* amade kir li ser babeta otonomiya edebiyatên hûrik (2012) û, bi hevkarî ligel Jordi Tejel Gorgas, jimareyeke kovara *Etudes Rurales* amade kir bi navê *Violence, Urbanité et Ruralité au Kurdistan* [Tundûtîjî, Bajarvanî û Gundewarî li Kurdistanê] (2011).

NAVEROK

Destpêk: *Tîr ji Kê, Armanc li Ku?*
Remezhan ALAN-Ergin Öpengin, 09

BEŞ I:
PAŞXANEYA SIYASÎ Û RENGVEDANÊN WÊ DI
EDEBIYATÊ DE, 21

Gotara Dijkolonyal û Wêneyê Serdestiya Tirkan
di Kovara Hawarê de
Zülküf Ergün, 23

Di Edebiyata Kurdî ya Modern de Lêrasthatinên Kolonyal,
Îmaja Netewî û Klîşeyeke Berevajîbûyî
Remezhan Alan, 49

Paratekst û Berxwedan di Pênaseya
Edebiyata Kurmancî ya li Tirkîyeyê
Clémence Scalbert-Yücel, 71

Çiroknûsiya Zazakî di Peywenda Dîrok,
Desthilat û Diyardeya Civakî de
Îlyas Akman, 87

BEŞ II: TEHLÎLÊN NAVEROKÎ, 115

**Xemên Rasteqîne Çareyên Nostaljik:
Xwendinek li Dor Romanên Şêzad Hesên**

Haşim Ehmedzade, 117

**Daxwaz û Endîşeyên Îroyî di Romanên Dîrokî de:
Xwendineke Muqayeseyî li ser *Hawara Dîcleyê* û *3 Gav* û
*3darek***

Fexriya Adsay, 131

**Keyal û Têgihîştina 'Kurdistan'ê di Romanên Kurdî de:
Hesta Berdewam a 'Biyaniþbûn'ê**

Özlem Belçim Galip, 155

BEŞ III:

PIRSÊN ZIMAN DI ÊWRA EZMÛNGERİYA EDEBÎ DE, 171

**Repertûara Zimanî û Afirandina Edebî:
Nirxandineke Zimannasî li ser Edebiyata Kurmancî ya**

Hevçerx

Ergin Öpengin, 173

Çîroknûsiya Zazakî di Peywenda Dîrok, Desthilat û Diyardeya Civakî de*

Îlyas AKMAN

1. Destpêk

Afirandinên edebî gelek caran li ser bingeha bîra dîrokî ya civa-ka xwe ava dibin. Heke ev afirandin, mîna di nimûneyên edebiyata Efrîqa, Emerîkaya Başûr, Rojhilata Navîn û Reşîkên Emerîkî de, li ser hîmê argumanên postkolonyal û edebiyata berxwedanê durist bûbe, bîra dîrokî û tecrubeya civakî dê teqez di afirandina edebî de cihê xwe bibîne. Bi gotinên Eagleton (2009: 54), metnên ku di vê çarçoveyê de peyda bûne heya dereceyekê têtikiliyên hilberînê yên civakî di xwe de di hewînî; destnîşan dikin ka dê bi mutabiqiyên çawa bêne xwendin an serfikirin; û axirî, di nava xwe de kodên îdeolojiya xwe jî dadirêje ka çawa, ji aliyê kê ve û ji bo kê hatiye afirandin. Ev yek ji bo wan deveran rastiyeke rût e li ber çavan. Gelo em ê çawa li wan cografayên din binêrin yên ku ji aliyê “dîrok”ê ve wek kolonî nehatine dîtin û hesibandin? Mesela em ê ji bo kurdan û welatên din vê têtikiliyê çawa îzeh bikin? Bi min, ev yek bi diyardeyên wê edebiyata bi navê “edebiyata berxwedanê” ve girêdayî ye. Heke di wê edebiyatê de bîra dîrokî û tecrubeya civakî bi îdeolojiyeke diyar û kêşeyeke desthilatdariyê ve bê girêdan, têtikiliyeke wê ya xurt bi arîşeyên desthilatdariya civakî re hebe (Eagleton 2011: 36), hingê mirov dikare behsa rehendekî din

* Wergera ji tirkî: Remezan Alan-Ergin Öpengin

bike ji bo wê edebiyatê. Teoriya postkolonyal û edebiyata berxwedanê van diyardeyên navborî –dîrok, diyardeya desthilatê û bend û pêwen-diyên civakî– bi dûvedirêjî û bi hûrbînî dinirxîne. Ji vî aliyê xwe ve, mirov dikare çîroka zazakî (kirdkî) bixe nav sînorên edebiyata berxwedanê. Lewma, em dê di vê gotarê de bala xwe bidin ser çend çîrokên zazakî û bi xwendineke hûr, hewla destnîşankirina wan mefhûm û taybetiyên edebiyata berxwedanê bidin ku di nivîsevaniya edebî ya zazakî de têne ber çavan.

2. Berdevkiya serdemên tarî: êşên me

Nirxandina me pêşî bi êşan dê dest pê dike. Ev tercîh ji bo hevahengiya ligel meyla nivîskaran hate kirin. Edward Said dibêje, “Di demên tarî de civaka nivîskaran bi piranî ji wan dixwaze ku ew bibin şahidê kul û kederên wan, bibin berdevkê wan û wan temsîl bikin” (Said 2009: 51). Gava em li çîroknûsiya zazakî ya modern dinihêrin, em dibînin ku nivîskaran guh daye vê daxwaza civakê û ketine nav hewldana afirandineke bi vî rengî. Her weha bi ya Ernst Renan, “Gava em behsa bîranînên miletekî bikin, êş ji serkeftinan girîngtir in. Çûnkî ya ku barekî dike ser pişt mirovan û dihêle bi hevkarî bikevîne nav kêferatekê ev êş in” (nql. Loomba 2000: 222), ku bi vî rengî balê dikêşe ser girîngiya derbirîna êşan ji bo bîra netewî. Ev êş carinan bi zarekî hişk hatine îfadekirin. Lê Memmi (2009: 117–118) diyar dike ku ne rast e nivîskar ji ber vî zarê hişk bi nankorî, bêhişî, ziman-dirêjîyê bê tawanbarkirin, û bi pirsên wek, “Gava nivîskar ceger kir devê xwe veke, ji van mirovan re ji xeynî serhildan û bêhuzuriya wan dikare behsa ciyê din bike? Ma hêvî heye mirov peyvikên aştiyê ji van mirovên derbxwarî bike? Ma mirov mineta xwe ji wî insanî dike ku evçend barê deynên faîzê ketiye ser?” fikra xwe diselmîne û van wek encama pêvajoya hatî serê wan dinirxîne.

2.1 Şewitandin û valakirina gundan û koçberî

Di çîroka zazakî ya modern de mijareke sereke şewitandin û valakirina gundan û koçberî ye. Hilbijartina van mijaran ji aliyê nivîskaran ve bi zanîn e, ji ber ku dîroka objektîf vê rastiyê di xwe de

dihewîne. Mesela tenê di navbera salên 1985 û 1995an de hejmara kurdên ku gundên wan hatine valakirin û berê koçê li wan hatiye ferzkerin zêdeyî sê milyonan e (Uzun 2005: 64–65).

Çîrokeke bi vê temayê “Yew Misqalika Keyfweşîye û Huyayîşî” ya Jêhatî Zengelan e. Ev çîrok ji bo destnîşankirina şewitandin û valakirina gundan û koça bi darê zorê balkêş e. Fermandarê ku tê gund hemû zilamên gund li meydanê dicivîne. Tenê bi fermanekê vê pêk tîne. Hêza fermandêr ya bêsinor û sertewandina gundiyan a bêgîlî û gazin di vê rewşê de berçav û berceste ne. Fermandar weha wan tehdît dike: “Aliyê xwe aşkere bikin, yan hûn ji me ne yan li dijî me ne. Ji bo me kesek di nîvî de nîne.”¹ Di pey re ji wan dixwaze ku bibin cerdevan. Ev stratejiyek e ji bo ku girseyê ji kirdeya berxwedêr veguherîne ya sertewandî. Heke vê qebûl nekin, bi şewitandina mal û bexçeyên wan û hemû gundî gefan li wan dixwe û dibêje kesê li ber xwe bide dê bi gund re bê şewitandin. Piştî axaftina xwe, fermandar ji Sofî Hesenê rîspiyê gund re, di nav gundiyan de, dibêje “bênamûso zurker” (“bênamûsê virek”) dibêje. Ev kesê salmezî ji neçarî nikare devê xwe jî veke. Fermandêr bi zanebûn ev kes bijartîye. Şikandina erza mirovên biqedr ên cemaetekê, li ber çavê endamên cemaetê, rêbazeke gerdûnî ya çewisandinê ye. Lewma Fanon (2007: 116) dibêje ku “di civakên edetî de bi piranî kesên rêzdar û xwedan qedr û gotin li pêş çavê hemû kesî tîne tehqîrkirin” da ku bi van gotinan diyar bike ku mêtînger, di vî karê mêtîngehkirinê de gelek caran kiryarên wiha encam didin. Di çîroka “Beyi Se Bena” de jî temayeke weke vê heye. Komek leşker di pey fermandarê xwe de dikevin nav gund. Berê xwe didin mala Huseyn Axa. Huseyn Axa jî gava leşkeran dibîne bi tirs ji malê direve. Lê gava ji malê derdikeve, ji ber lez û bezê ji bîr dike şewqeya xwe bide serê xwe. Ev cara pêşî ye ku keçeliya serê wî xuya dike. Cara pêşî ye ku gundî vî halê wî dibînin. Leşker vê rûmeta wî hinekî din jî dişikînin. Axir rêveberiyên zordest, carina rasterast kesên ji bo civaka xwe birûmet dihetikînin, carinan jî wekî di vê çîrokê de vê yekê bi awayekî neyekser

1 “Cayê xo bellî bikî, şîma yan kîştî ma de yî yan zî vera ma de yî. Orte de vindertiş çin o.” (Zengelan 2007: 97)

dikin. Tirs a leşkeran dike ku Huseyn Axa şewqa xwe ji bîr bike û keçeliya wî ya ku bi salan e ji derdora xwe vedişêre aşkere bibe.

Di çîroka “Yew Misqalika Keyfweşîye û Huyayîşî” de gundî naxwazin bibin cerdevan. Lê digel vê nafikirin ji gund jî derkevin. Lê leşker di biryara xwe de hişk in. Li gund pêşî xaniyên ku kes di wan de nîne dişewitînin û weha çavê wan ditirsînin. Her ku diçe xelesa korerêyê li dora gundiyan teng dibe. Li ser vê zilm û tehdêyê, gundî hew debar dikin û yeko yeko, dido dido gund berdidin. Lê ev berdan wisa hêsan çênabe. Ev tê wê maneyê ku hebûna wan tev di derbekê de ji holê rabe.

Çîroka “Mergê Yew Kutikê Esîlî” ya Roşan Lezgîn jî bi awayekî giştî li ser şewitandina gundan û koçberiya bi zordestî hatiye hûnan. Ev rewşa civakî û siyasî ya têr êş û rûxandin bi paraleliya hêmanên xwezayê hatiye xurtkirin. Kîşwerekî sar î hişk hukmê xwe digerîne li war û welatî, ku ev cure kîşwer di edebiyata cîhanî de gelek caran temsîleke alegorîk a rêveberiyên zordest e. *Şatoya* Franz Kafka nimûneyek e ji wan berhemên edebiyata cîhanî. Bi van gotinên hanê yên ji çîrokê tê diyarkirin ka hukimranên meydanê kî ne: “Teyr û tilûrên mihacir ref bi ref çûbûn germiyanan. Meydan ji qijikan re mabû.”² Bi herikîna çîrokê re xwendevan têdigihe ku piraniya gundiyan bi darê zorê hatine koçberkirin û xaniyên wan hatine şewitandin. Bi tenê çend malbat mane ku xaniyên wan nehatine şewitandin û ji gund nehatine derxistin. Berê sibehekê ew gundiyan mayî bi dengê çekan şiyar dibin û deng her diçe nêz dibe. Axir ev deng digihîje ber deriyê wan. Gundî ji malên xwe tene derxistin û xanî tene şewitandin. Ew tenê bi xemgînî ji dûr ve bêçare li vê şewatê dinihêrin. Piştî vê, gundiyan mayî jî ji neçarî gund ditterikînin. Kûçikên xwe, yên ku bi salan dilsozê wan bûn, li pey xwe dihêlin. Kêlîka ku ji gund derdikevin, wekî ku kûçik niyeta wan fêm kiribe, li pey mînbûsê baz dide. Di dawiyê de, di keysekê de xwe davêje pêşiya erebeyê, lê dikeve bin û birîndar dibe. Xwediyê kûçik ji erebê peya dibe, ber kûçik dikeve, lê neçar wî li wir bi birînen wî

2 “Teyr û tiyûrê macirî ref bi ref ver bi germistanan wa şibîy. Meydan qijikan û qelan û qorbela rê mendibî.” (Lezgîn 2006: 37)

re dihêle. Kûçik di nav birînan de dike nalenal û di dawiyê de li ber hişkesermayê dimire. Yên ku esil xwediyê gund in ji gund bar kirine û heywanên wan jî ji xwe re delîveya jiyane nedîtine. Gava ku girêka metaforîk zelal dibe, çivîkên didine rêya koçê û qjîkên biyanî li dormedora gund vedihewin jî digihine wateya xwe ya sembolîk.

Çîroknûsên zaza ew çend qîmet dane diyardeya koçê ku di hinek çîrokan de ji yekê zêdetir halên koçê cih digirin. Yek ji van, çîroka “No Kî Mara Wo” ya Munzur Çem e. Di çîrokê de kalekî heştê salî heye, ku di 1994an de gava li Dêrsimê gund tèn şewitandin ji neçarî koçî Elmanya dike. Bi rêbaza şepola hiş (herikîna hiş) kalo li raboriya xwe tê veğerandin û li bûyerên wî çaxî difikire, nefis û qiyasekê dike. Di çîrokê de sê bûyerên koçê pêk tèn. Ya pêşî, di dema Osmaniyan de dibûre. Kesê di navenda çîrokê de Dewrês Silêman an jî Sêy Silêman e, ku Dêrsimiyan ew nav lê kiriye û wekî yekî pîroz dîtine. Osmanî wî kesî sirgûnî Sînopê dîkin. Ji ber ku di kêlîka mirina wî, şûştin û veşûştina wî de hinek bûyerên derasayî pek tèn, di nezera gel de dibe yekî pîroz. Ev bûyer ji devê Memed tê vegotin, ku dema leşkeriya xwe ya li Sînopê ji milletê wir bihîstiyê. Sirgûna duyan di 1938an de pêk tê. Piştî qirkirina Dêrsimê, dewlet hinekan dişîne Boyabatê. Lehengê çîrokê Memed hê di leşkeriyê de, riya wî dikeve Boyabatê jî. Lê li wir rastî bêlomeyekê tê ku qet ne li bendê ye. Li sûka bajêr rastî gundiyên xwe yên sirgûnîkirî tèn. Ev dibe sedema kêlîkeke nostalgîk a dijwar ji bo her du aliyên. Lê ev kêlîk bi xemgîniyeke giran derbas dibe. Kêfxweşiya ji ber dîtina nas û dostan di kêlîkekê de vediguheze xemgîniya bîrhatina qir û felaketan. Sirgûna sisêyan di 1994an de ye. Memedê ku hatiye heştê saliya xwe, piştî şewitandina gund xwe digihîne Elmanyayê. Lê hişê wî her tim li ser rojên berê û gundê xwe ye, gundê ku ji neçarî terikandiyê. Ji aliyekî ve wisa hest pê dike ku sirgûna hafî serê wan ji qira 1938an jî girantir e. Bi van hevokên xwe trajîkiya bûyerê derdibire:

“Dewletê di 1938an de millet sirgûn kir, lê qet nebe devereke şanî wan da ji bo lê bimînin û kême zêde hinek erd da wan. Lê vê carê wisa nebû. Hat, got ‘terk bikin herin. Hûn diçin kû biçin. Hûn çî dîkin bikin’ û tişteki din negot”/“Dewlete 1938 de

milet surgin kerd, qet ke nê o wext ca misna re ci, zîyade-kêmiş hêgayî dayî ci. Na raye a kî nêbîye. Ameyî, ‘Terk bikerê şêrê, se kenê bikerê’ vat û cîyêde bîn nêvat. (Çem 2005: 80)

Di çîrokê de cihdana çend bûyerên koç û sirgûnê ne tenê di dema komarê de her weha di dema Osmaniyan de jî berdewam e. Wekî ku nivîskar ji xwendevanan re bibêje, bi maweya dîrokê diyardeya koçkirinê ji vî gelî re musteheq hatiye dîtin. Hilbijartina lehengan jî bi zanîn e, bi hûrbijarî ye. Di dema Osmaniyan de lehengê ku tê sirgûnkirin ne belesebeb kesekî pîroz e, lewre ev îfadeya zilma zordaran e ku jê re sînor nîne. Di bûyera sirgûnê ya sisiyan de, sirgûna kesekî heştê salî jî rasterast bi vî mebestê ye. Her weha di sirgûna duyan de jî şahidiya Memed li leşkeriyê jî watedar e. Li wir yê sirgûnkirî gundiye wî ne. Yanî serdest hem koça ku zilmeke giran e tîne serê wî gelî hem jî hêza xwe ya leşkerî ji nav wî gelî pêk tîne. Xwendevan bi wêneyekî trajîk re rû bi rû tîn hiştin. Ji nav gel singû xistine destê hinekan û berê wan dane hinekên din ên heman gelî. Memed wek prototîpekî zazayan e ku ew birine leşkeriyê. Ew ji wan kesan e ku berê singûyên wî pêşî ketiye gelê wî de, ev yek bi zanîn pê hatiye kirin. Ji ber ku di 1938an de dewlet ne bi dewleteke din re, bi mirovên di bin desthilata xwe re, bi Dêrsimiyên re, di nav şer û pevçûnê de ye.

Koç û sirgûn, gelek caran dibe sebebê bîreweriyeye parçebûyî û windabûna reh û kokan. Hemû nîrxên hebûnê li paş dimînin û bêgav dimînin ji bo pejirandina wesfên ontolojîk ên nû ku pêvajoya pejirandina wan jî zor e. Lewma bi gotina Said (2009: 55), “Sirgûn, kesê di navbera du aşan de ye, ne dikare bi derdora xwe ya nû re bibe yek, ne dikare ji rabirdûyê biqete, ne girêdana wî û ne jî veqetîna wî temam e.” Bi vî rengî bîreweriyên derizî jê dizên. Piştî çend nîşan êdî amnezî an bîrokiya çandî dest pê dike. Di nav van nîşan de gava behsa serborî û diyardeyên jiyane bîn kirin û nîrxandinek bê kirin, bi tenê nîşek du nîş tîn bîrê. Êdî esil wesfên haydarbûnê ji bo wan hestiyariyeye otantîk e. Serdestên ku ji vî haydar in, hem bi derxistina gelê niştecih ji warê wan qada desthilata xwe berfirehtir dikin, hem jî ji ber ku polîtîkayeke asîmîlasyonê ya xurt di-

meşînin, dixwazin gel adapteyî wan dam û dezgehên civakî yên nû bikin ku ji bo rihettir birêvebirina bernameyên xwe yên siyasî û li gor armancên xwe ên siyasî ji berê de saz kirine.

Tesîra wêrankar û biêş a pêvajoya koçê bi rengê aşkere di diyardeya zimên de tê ber çavan. Çîroknûsên zaza jî bal kişandine ser arîşeya zimên ya li wan navendên ku piştî koça bêdil bûne cihê cîwarbûnê. Ji ber ku çîroknûsên zaza dixwazin ferasetêke nû biafirînin, hewl didin pêşiya vê qutbûna zimên bigirin, lewma dikevin heyra afirandina karakterên angaje. Du derfetên sereke hene di vê binirxkirina hişmendî û hestiyarî ya karakteran. Nivîskar bi vî awayî xweşhaliya xwe ji hin wesfan aşkere dike; diyar dike ku wan dixwaze û diecibîne, bi kurtî, “pesendkirina xwe ya hişmendî/fikrî” ya derheqê jiyanê de derdibire. An jî berevajî vê, dikare weha eşkere bike ku ji hinek diyardeyan hez nake û bi hukmên xwe yên tawanbarker ên derheqê wan de rik û nefreta xwe ya beramberî wan diyardeyan derdibire, bi kurtayî, “redkirina xwe ya hişmendî” derdibire (Pospelov 2005: 122). Di çîroka “Serbilindîya Evîne û Rojda” de pêvajoyeke weha dixuye. Serhatiya malbatakê ya bi kurdî re tê ber çavan ku ji gund koçî bajêr kirine. Evîne û Rojda, keçên piçûk ên vê malbata ku li navenda bajêr bi cih bûne, di adabtebûna dibistanê de zehmetiyê dikişînin. Li dibistanê perwerde bi tirkî ye. Ji ber ku Evîne û Rojda baş bi tirkî nizanin zarokên din henekên xwe bi wan dikin. Di ser vî halî re, Sercanê bavê wan ji ber karê xwe mehekê li Îzmîrê dimîne. Dema vedigere hinek guherînên ne xweş dibîne. Di nav malê de ne bi kurdî, lê bi tirkî diaxivin. Acizîya xwe ji ber vê rewşê ji xanima xwe re dibêje. Ew jî dibêje, “[j]i ber ku tirkîya keçikan pir ne baş e hem ji dersan baş fêm nakin hem jî zarokên din henekên xwe bi wan dikin. Me dît ku tu çareya din nîne, me jî ev biryar da, keçik wê bi apê xwe re bi tirkî biaxivin, bi min re bi kurdî.”³ Gava Sercan dipirse ka li dibistana wan tu zarokên kur-

3 “Qet pers meke, tirkîya domanan rind nîya, hetê ra derse de zaf tengê ancenê, hetê ra kî telebeyî pê huyîne, kay kenê. Ma niyada ke sewbîna (zobîna) çarê çin o, qerar da ci ke mi de kurdkî, apê xo de tirkî qesey bikerê.” (Çem 2005: 105–106)

dan nînin, xanima wî dibêje, “[h]eçî tirk in jixwe tirk in, yên kurd jî dixwazin xwe tirk bidin nîşandan. Ne tenê zarok, dê û bavên wan jî dixwazin ku zarokên wan bi ‘tirkiya kubar’ biaxivin.”⁴ Li ser vê yekê Sercan gazî li birayê xwe û her du keçên xwe dike, ji wan re dibêje, “[q]et guh nedin tu kesî, gava hewce kir tepa xwe li singa xwe bidin û bi dengê bilind bêjin ‘ez kurd im û zimanê min kurdî ye.’”⁵ Wisa xuya ye zarok jî guh didin vê şîreta wî û wekî wî gotî dijîn. Di çîrokê de bi awayekî aşkere pesendkirineke hişmendî û redkirineke hişmendî xuya dike. Li hember kesên ku ji aliyên efendiyan ve hişê wan hatiye dîlgirtin, ji nirxên xwe hatine dûrxistin û kesên ku ji aliyê nivîskêr ve wek siya mirovekî hatin navlêkirin, li rexê redkirina hişmendî xuya dikin; li aliyê din, yên ku li dijî vê radibin û hebûna xwe diparêzin jî li rexê pesendkirina hişmendî xuya dikin.

Çîrokên wek “Doktorê Ma”, “Ti Kî O Hardo Bimbarek Ra Wa”, “Qirvan”, “Halîn”, “Xelîl Kişîya” jî ji wan in yên ku bi rengê yekser an neyekser berê xwe didine şewitandina gundan û diyardeya koçê.

2.2 Rêbazên çewisandinê yên siyasî û psîkolojîk

Yek ji rêbazên ku serdest ji bo kontrolkirina gelê di bin hukmê xwe de didine ber xwe siyaseta çewisandinê ye. Ev siyaseta dibe sebêbê rewş û encamên gelek trajîk, lewre xwe dispêre kiryarên bêrehmane yên wek kuştin, tehqîrkirin û tîrsandinê. Yek ji wan kiryanan kuştin e. Girseya armanc ji kes û kûsên ji tebeqe û tîpolojiyên cihê tîn bijartin û, bi vî rengî, peyamê didine tevahiya civakê ku ew jî di ber nîşana tîrên wan de ne. Bi vê çewisandinê armanc ew e ku hê di qonaxa fikirînê de bendek li pêşiya çalakgeriya mirovan bê danîn.

Yek ji wan çîrokên ku ev tema hûnaye “Xelîl Kişîya” ya Jêhatî Zengelan e. Xelîl mexdûrekî koçberiyê ye. Piştî gundê wan tê şewitandin tevî du zarok û bermaliya xwe tê li Amedê bi cih dibe. Paşxaneya bajêr a psîkolojîk weha ji xwendevanan re tê saloxdan: “Kuçeyên Amedê

4 “Ê yê ke tirk ê xwe ra tirk ê, ê yê ke kurd ê kî wazenê ke xo tirk nîşan bike-rêne.” (Çem 2005: 106)

5 “Qet goş ro ser menêne û demo ka îcab kerd kî destê xwe sîneyê xo rê dêne, bi vengo berz vazêne ke ‘ez kurd a, zimanê mi kî kurdkî yo.’” (Çem 2005: 107)

ketibûn rengê sor, sorê xwînê. Bi sorê xwîna mirovan sor bûbû. Tir-sê li kuçeyan çirk dida. Xwîna mirovan ji avê erzantir bûbû belkî.”⁶ Xelîl ji ber rojnameya ku dixwend ketiye nav listeya kesên ku dê bên kuştin. Wî bi xwe, ji berê de, guman ji vê yekê dikirin. Gava ku di çapemeniyê de nûçeyên li ser kuştinan dixwendin diheyirî, ditirsiya ku rojekê ew jî bibe nûçeyek ji wan û axirî di vê tirsaxwe re derdikeye û rojekê tê kuştin. Ew kesek e ku qet neketiye nav tu çalakiyên siyasî. Belê tenê şopandina rojnameyeke muxalif têrî wê yekê kiriye ku ku wî jî bixine nav rêza kesên xeternak. Di şexsê wî de peyamekê didin civakê ku kesên çapemeniya muxalif bişopînin dibin hedefa wan û rêbazeke çewisandinê ya bi vî awayî didine ber xwe.

Kuştinên wisa di çîroka “Xal Mehmed” ya Jêhatî Zengelan de jî xuya dikin. Şivanên gund Xal Mehmed, Remezana û Ehmed rojekê li ber pez tîn kuştin. Serê sibehê gundî li wan digerin. Pêşî dibînin ku hinek heywanên wan bi devê tifingan hatine kuştin. Ev tehdîtek e ji bo gundiyan ku dibe mal û mewdanê wan giş jî bê tunekirin. Gundî bêhedan digerin û pêşî cendekê Remezên dibînin. Paşê rastî cendekê Xal Mehmedê kal tîn. Di dawiyê de digihîjin cendekê Ehmed. Ev bûyer di çapemeniyê de cih digire, lê dûrî rastiya xwe. Di çapemeniyê de wisa tê nivîsandin ku sê terorîst di pevçûnekê de ji aliyê leşkeran ve hatine kuştin (Zengelan 2007: 83). Çapemeniyê bi vî hawî erkê amûrekî îdeolojîk girtiye ser xwe. Bi kuştina van sê kesên bêrî û dûrî her çi çalakiyeke siyasî dixwazin bêjin ku ya hûn ê ji sîstemê re serê xwe bitewînin yan jî mirin pir ne dûrî we ye.

Çîroka “Tena Estarey Şahid Bîy” jî bi vê armancê hatiye nivîsandin. Li vir jî tê dîtin ku serdest wek rêbaza çewisandinê hemû tebeqe û tîpolojîyan dikine armanca tîrên xwe. Bavê lehengê çîrokê mamoste ye. Bavê wî gava serê xwe bi polîtîkaya muxalif re diêşîne û pê dipeyive êdî xezikeke çep û rast li ber navê wî jî dixin, piştî kurtedemekê wî ji kar derdixin. Ev kiryar nîşaneyekê berçav e ji bo

6 “Kuçey Amedî rengê gonî de bîy, sûr bîy. Pê rengê gonîya însanan sûr bibîy. Ters kuçay û kolanan de geyraynî. Ne tenê kuçanî Amedî de. Gonîya însanan awe ra erjanêr bî belkî.” (Zengelan 2005: 83)

peyama ku dikarin hemû kesên muxalif bixine nav pencên belengaziyê, ku vê peyama di şexsê wî mamosteyî de didine tevahiya civakê.

Aşkere ye ku ew siyaset digihîje armanca xwe jî. Ev “serketin” herî baş hingê diyar dibe gava tîrsa ji efendî xwe di şûra takekesan cîgir dike. Çîroka “Beyî Se Bena” bi rengekî serketî vê tîrsa navxweyîkirî tîne ber çavan. Gava ku du esker diçin gundekî din, li gundê Sayerekê disekinin da bêhna xwe vedin. Mela Mahmud û Bengî du eskeran li nav baxçe diezimînin. Hêmaya eskeran ya di hişê wan de vê ezimandinê bi wan dide kirin. Di vê bêhnvedana leşkeran de tam bi psikolojiya serdestan gund dîkin objeya lênihêrtina xwe û bi vê ferasetê gund raçav dîkin. Di wê kêlîkê de karakterê Beyî jî dikeve ber vê raçavkirinê. Eskerek bi xwebawerî çavê xwe ji Beyî nade alî. Bengî pêşî xwe li vê nihêrtina derî-edeb nake xwedî. Esker, digel ku mêrê wê li cem e, berdewam lê mêze dike. Wextê ku esker çav li Beyiyê dike, êdî xîreta Bengî hew tehemul dike û bi hemû qeweta xwe şemaqekê diweşînê. Piştî vê şemaqê qêr ji esker diçe lê yekî ku ji wî bêhtir diqîre heye, ew jî Mela Mehmud e. Mela Mehmudê ku hê sebebê vê şemaqê nizane bi ser Bengî hildibe û dibêje, te li hikumetê xist, tu zanî wê dawîya vê çî be. Ev tirs û qêrîna Mela Mehmûd gundiyan hêmaya eskeran ya di serê gelek gundiyan de aşkere dike, anku ew hêmaya serdest û ya ku di her hal û mercekî de divê serî jê re bê tewandin. Sertewandina li ber hêmaya esker, di heman çîrokê de heta bi radeya xwedatiyê diçe. Eskerên ku ji gund derdikevin digel fermandarê xwe û komeke eskeran vedigerin. Huseyn Axa pêşwaziya wan dike û li mala xwe wan diezimîne. Huseyn Axa, gava behs tê ser meseleyê, ji fermandar re dibêje bila Bengî xulamê te be. Kurd ji bo hurmetê gava ku behsa zarokên xwe dîkin wiha dest bi axiftinê dîkin. Lê belê, ya li vir “xulamî” yeke tenê ji ber tîrsê ye û pênaseyek e ku hewce ye bê nirxandin. Huseyn Axa heçko fermandar hildike payeya Xwedê û li ber digere ku luftekê jê re bike, anku Bengî efû bike. Huseyn Axayê ku têdigihe kesek nikare li ber vê hêza “mezin” bisekine, wisa difikire ku ji “dia” yeke libergerîne pê ve nikara bi tu awayekî din berê xwe bide fermandar.

Di çîroka “Nobedar” ya Deniz Gunduz de jî heman rewşa psîkolojîk dixuye. Çîrok li gundekî dibore ku zivistaneke sar lê li kar e. Fermandarê qereqolê, rojê çend kesan dişîne nobedariya dibistana li derveyî gund. Gundî bi dorê diçin. Di çîrokê de ya balkêş ew e ku di wê demê de dibistan girtî ye. Digel ku dibistan girtî ye şandina gundiyan ji bo nobedariyê, ku gundî mirina xwe didin ber çavê xwe û diçin, nîşana wê tirsê ji serdestan e ku di dil de zîl daye. Serlehengê çîrokê Sileman e. Li mala Sileman wêneyê Mustefa Kemal Atatürk, Hezretî Elî û 12 îmaman heye. Jixwe hema bêje li mala hemû gundiyan jî ev wêne hene. Lê gelo daleqandina wêneyê Mustefa Kemal li hember serdestan hemleyek e an tevgereke jidil e, ango tevdîreke bihesab e? Nêrîna serdestan bi gotinên fermandarê qereqolê berçav dibe: “Hûn vê dikin da ku dewletê bixapînin, lê dewlet bi van wêneyên we naxape.”⁷ Li ber çavê wî, wêneyên desthilatê yên ku bi malan ve tînan daleqandin bi tenê manewrayeke siyasî ye. Di tevahiya çîrokê de Mustefa Kemal-Dewlet-Leşker bi maneya peyamên nêzî hev û carinan jî dêvila hev ve tînan bikaranîn. Li aliyê din, nêrîna gundiyan ku vê tevgerê pêk tînin jî di serî de wekî ku cuda be dixuye, lê di eslê xwe de ji bo heman armancê ye. Mesela Sileman dibêje, ne ji ber ku ji Mustefa Kemal ditirse wêneyê wî dadileqîne, ji ber hezkirinê wê yekê dike. Lê tam li vir Taner dibêje, heke em jê netirsîbûna di vê qir û qiyametê de em ê hatibûna nobetê? Di vê qufaliyê de, qereqol wê çawa bizanibe ka em hatine nobetê yan na? (Gunduz 2004: 13). Bi van gotinan aşkere dibe ku çalakîya wan ji ber tirsê dilê wan e. Hevahengiyê navxweyî heye di vê gotara wan de. Bi rastî jî heke neçin nobetê, xebere qereqolê jê çêna-be ji ber ku berfê rê girtiye û berf û qufalî rê nade kesek ji mala xwe derkeve. Lê tirseke emirdirêj heye li holê ku di dilê wan de cîgir bûye û hemû hebûna wan dagîr kiriye. Bi gotineke din “desthilata çav” li ser wan e. Navxweyîkirina tirsê ji efendiyan xwe ji wan mijaran e ku di tarîxê de rewşenbîrên dinyayê gelek li ser fikirîne. Freire (2010: 42) vê bûyera ji Emerîkaya Latîn radigihîne, ku ji aliyê navxweyîkirina tirsê efendiyan ve dişibe çîroka nobedar:

7 “Şima niye kenê ke dewlete bixapnerê lê dewlete bi nê resma qan nêbena.” (Gunduz 2004: 12)

Hevalekî min î civaknas behs kiribû ku li welatekî Emerîkaya Latîn komek gundiyan çekdar berî çendekê herêmeke çandiniyê zeft kiribû. Gundiyan wek taktîk plan danîbû ku xwediyê axê jî gerew bikin. Lê tu gundiyeke ceger nekiriye li ber xwediyê axê bibe nobedar. Hebûna xwediyê axê bi tenê jî tirsna bû. Her weha mumkin e ku serhildêriya li hember patron jî bi wan re hesteke gunehbariyê çêkiribe. Ya rast, patron di “hundir”ê wan de bû.

Ji ber vê tirsna navxweyîkirî û “desthilata çav” darê efendî her tim li ser serê wan e. Piştî ku hişmendiya bindest hate zeftkirin, hebûna efendî berçav nebe jî, hebûna wî her tim li ser “milkê wî” amade ye. Foucault di ser avahiya Panoptikon re, ya ku birayên Jeremy Bentham û Samuel Bentham dîzayn kiriye, behsa “desthilata çav” dike. Li Panoptikonê du xalên girîng hene ji bo yê ku dê kontrol bike. Yek ji van xalan bi ya Jemery Bentham kakilê planê ye. Betham diyar dike ku raçavkirin di navenda planê de ye û ji bo ku ev raçavî baş û çalak were kirin merc ew e “divê yê ku raçav dike bi xwe nexuye”. Sedema sereke ya vê prensîbê ew e ku divê yê ku raçav dike li wir nebe an li wir be lê raçav neke jî ew hestê bidine mirovan ku tene raçavkirin. Bi vî hawî desthilatdarê oterîteya xwe li ser piyan dihêle (Özdel 2012: 23–24). Di çîroka “Nobedar” de jî awayekî “desthilata çav” heye ku gundiyan di nava xwe de pejirandiye. Leşker ne li wir bin jî hukmê wan li wir e, çavê wan li wir e. Di berdewamiya çîrokê de ev tirsna di dil de rûniştî bi hinek bûyeran şênber dibe. Ji ber tiştekî Sileman tê binçavkirin, wî dibine Diyarbekirê, navenda OHALê. Li Diyarbekirê, gava waliyê di teftîşa leşkeran de dibihîze Sileman li wir girtî ye, dixwaze wî jî bibîne. Gava walî tê cem, Sileman di dilê xwe de dibêje, “Mirov newêre li nava çavên wî binihêre.”⁸ Ev gotin nivîskêr bi zanîn aniye xistiye çîrokê, lewre bindestê ku hukmê serdestên xwe navxweyî kiribe bi hêsanî nikare li nav çavên serdestî binihêre.

8 “İsan nêtawreno ke zereyê çimanê ey de niyado.” (Gunduz 2004: 23)

2.3 Peqandina kunêra “hov” û “biyanî”: qirkirina Dêrsimê

Bêyî têgihîştina têkiliyên karakterîstîk ên dema derketina berhemê tevî bûyer û mercên wê demê, ne mumkin e ku piraniya berhemên edebî bêne vekolîn û tehlîlîkin. Lewma divê zanyarê edebiyatê agahî û darazên zanistên dîrokî yê din li ber çavan bigire. Ji bo edebiyatnas, nêrîneke ku bi dîrokê hatiyê tûjkin, bi taybetî di lêkolînên edebî yê polîtîk de, şertekî bingehî ye (Pospelov 2005: 101). Lewma, berî em dest bi nixandina çîrokên bi mijara qirkirina Dêrsimê bikin, hewce ye peywenda dîrokî ya vê mijarê jî bi xalên xwe yê sereke ve bê pêşkêşkin.

Di salên 1937 û 1938an de, yek ji qetlîamên herî trajîk ên dîroka Komara Tirkîyeyê pêk hat. Mirina bi hezaran kesan, sirgûnkirina ew çend kesan, şewitandina gundan, zarokên ku ji malbatên xwe hatin cudakirin, û kêşeyên trawmatîk ên ku dê bi dehan salan bi-domana encamên vê komkujiyê ne. Ji serdema Osmaniyan û vir ve stratejiyên cur bi cur li dar bûne ji bo duristkirina hakimiyetê li ser vê axê. Hêmaya dewleta serdest, hêmaya dewleta dilovan, aborî, dîn, bexşkirina statûya civakî diyardeyên sereke yê vê stratêjiyan in. Di raportekê de ku ji aliyê dewletê ve hatiye amadekirin, ev gotin cih digirin:

“Di serdema Tanzîmatê de ji ber ku wîlayetên şerqê tev bi derebegiyê dihatin rêvebirin û ji bo ku hema bêje dewletê bi çavekî biyanî li van deveran dinihêrî, Osmaniyan bi belavkirina nîşan, rutbe û xelatan xwestiye herêma Dêrsimê bixin bin destê xwe.” (Çalışlar 2010: 153–154)

Li vir têgeha girîng ya “biyanî” ye. Wisa xuya ye ku împeratorî pêkhateyeke di nav sînorên xwe de naecibîne û wê ji xwe re biyanî dihesibîne. Lê tu fikra împeratoriye jî nîne ku van “biyaniyan” di halê wan de bihêle. Bi feraseta ku rêveberên herêmî bikişîne aliyê xwe û desthilatdariya xwe li wir xurt bike hinek rutbe û statûyan dide wan. Fanon jî bi van gotinên xwe destnîşan dike ku bexşandina statûya civakî rêbazeke berbelav e ji bo desthilatdariyê:

Mêtinger ji bo bigihîjin armanca xwe du cure hevkarên herêmî ji xwe re çêdikin. Yek ji wan hevkarên kevn û gelêrî ne: Serekeşîr, kaîd û remildar û hekîmên gelêrî (...) Eşîr weke keriyekî dide pey riya ku serek xêz kiriye. Mêtingerî bi serweteke piçûk xizmeta van bendeyên xwe ên dilsoz misoger dike. (Fanon 2007: 137)

Heke mirov hinekî din jî li dîrokê bikole dê bibîne ku mêtinger serî li hinek rêbazên din jî didin. Mesela dîn gelek caran ji bo kedî-kirinê hatiye bikaranîn. Di raporteke din a dewletê de weha tê gotin li ser vê babetê:

Her weha bi fikra berbelavkirina baweriya rast, divê di nav kurdan de çend şêxên Nexşebendî li deverên munasib teke û xaneqeyan vekin û millet bînin ser riya rast, nexwe ji bilî vê pir zehmet e ev armanc pêk were. Lê heke ev şêx ji aliyê dewletê vê bînin wezîfedarkirin wê bibe sebeb ku millet li wan bawer neke. Lewma qenc e ku bi awayekî ne fermî, bi dizî bi qasî ku hewce ye alîkarî û meaş bê dayîn. Digel vê divê memûriyeta wan bê veşartin û wekî ku vî karî ji xêra xwe re dikin bê xuyakirin. (Doğan 2012: 69)

Piştî ku ev jî nebû derman, êdî tedbîrên dijwar ên wek sirgûnê ketin dewrê. Dîsa di raporteke ji sala 1909an de ji bo gelê Dêrsimê “bi fitrata xwe miletekî hov e” hatiye gotin (Çalışlar 2010: 185). Ev gotin benîştê devê hemû dewletên mêtinger e. Dibêjin, dema me ew xistin bin destê xwe her weha em ê wan ji hovîtiya wan rizgar bikin, wan bigihînin medeniyetê. Bi vî awayî dagîrkin ji nişka ve diqulibe ser xêr û lutfekê. Ev gotin bi armanca meşrûkirina hêza mêtingeran e, lewre, bi gotinên Memmi (2009: 93), “Mêtinger kengê bibêje, mirovên bindest diz in, hinekî xwedî hestên sadîst in, xerab in, kevneperest in, wê gavê dixwaze polîsên xwe û tehdeya xwe bi vî hawî meşrû bike,” ku bi vî rengî berî li ber îtirazên ji gelê xwe jî digire.

Di raporteke din de tê gotin ku ev gelê Dêrsimê yê hov, di heman demê de “kunêr” e ji bo dewletê. Hewce ye ku li ser vê birînê destkariyê tund were kirin ji bo saxî û silametiya welêt (Çalışlar 2010: 231). Ev raman ji radeya jêr heta ya bi jor di hemû erkdarên dew-

letê de li kar e. Ji ber ku serkêşekî dewletê, serekê leşkeriyê Mareşal Fevzi Çakmak gotiye, “Dêrsimî bi mistdanê nayên qezenckirin. Destkariya hêzên leşkerî dê bêhtir tesîrê li Dêrsimiyên bike. Divê Dêrsim wekî mêtîngehekê bê dîtin û li vir rêveberiyêke kolonyal bê avakirin.” (Doğan 2012: 99)

Rengvedanên vê siyasetê di çîrokên zazakî de rengêkî dagîrkinê girtiye. Ji ber ku dema ku çîrok tînan analîzkirin, mijarên sereke ev in: Komkujî, tecawiz, psîkolojiya tirsê û heta kuştina dergûşan, ku hinek caran bi awayekî trajîk ji destê diyên wan diqewimî gava ku di şikeftan de ji bo ku deng neçe eskeran bi destê xwe devê wan digirtin.

Em dibînin ku bi riya hin çîrokên Munzur Çem ev komkujîya Dêrsimê bûye mijara deqên edebî. Mesela di çîroka “Di Vîlikê Verê Vare” de paşxaneyê vê bûyera dîrokî heye. Çîrok li dema komkujîya Dêrsimê derbas dibe. Lehengê bi navê Sêykalî Dede di fikareke mezin de ye. Bi şevan ranazê û her tim çavê wî li derve ye. Dengê herî nizm ê xwezayê jî bala wî dikişîne û guh didiyê. Û ev tirs mezinahiya derûniyê nîşan dide. Bûyera sereke ya ku wî dixê nav van fikaran, dilsoziya wî ya bo keçên xwe ye. Yek ji bûyerên ku di salên komkujîyê de dihat serê keçan tecawiz bû, û ev bûyer jî wekî her kesî Sêykalî Dede dixê nav fikaran. Dîsa rojekê wexta bi van fikaran li der û dor digere, dibîne ku komeke leşkeran ber bi gundê wan ve tê. Çawa ku leşker digihîjin gundê wan hemû gundî cihê xwe de dibin kevir. Lê du kes ji vê rewşê xwe zû xelas dikin, Keçên Sêykalî Dede, Eslî û Nazlî. Beriya ku leşker wan dîl bigirin, lezelez ji gund ber bi çiyê ve direvin. Leşkerên ku wan dibînin li dû wan diçin. Di nav daristan û xwezaya asê de reveke dûdirêj dest pê dike. Lê belê wexta her du keç digihîjin serê zinarekî dawî li revê tê. Di vê neçariyê de du rê ji wan re dimînin, an wê teslîmî leşkeran bibin an jî wê xwe ji zinar bavêjin. Nazlî dibêje: “Teslîmî wan zaliman nebe xwişkê. Ew heqaretê li me dikin, me ji namûsa me dûr dixin. Me nekujin jî, me bi rûreşî berdidin û ev ji mirinê jî girantir e.”⁹ Eslî bi gotina

9 “Xora bêbextan dest medîme wayê. Ê, ma rê heqaret kenê, ma namûs ra finê dûrî. Eke ma mekîsê kî, risîyayêda henêne anê ma sere kem erdene ra xirav a.” (Çem 2005: 39)

xwe gazindan ji bextê xwe dike û dema leşker nêzî wan dibin her du xwişk cara dawî li hev dinihêrin û xwe ji zinêr davêjin. Li dû wan şopên xwînê ku li cihên cuda yên zinêr belav bûne û cesedê wan ê perçiqî dimîne. Yek ji leşkerên ku dibê şahidê vê mirinê Hêydero Tirkmen e. Piştî vê bûyerê ji koma xwe vediqete û bi tena serê xwe diçe daristanê. Bi xemgîniyeke mezin awirên xwe dide jor û bi van gotinên xwe ji Xwedê gazindan dike, “Tu li kû mayî, çima dengê te dernakeve?”¹⁰ Ji ber ku leşkerek vê îsyanê dike, ji hêla nivîskarî ve pakkirineke qismî çêdibe. Ev nîşan dide ku di salên komkujiyê de her kes ne dilxwaz e ku “kunêr”ê bipeqîne. Xaleke din a balkêş di çîrokê de pûç derhatina hêviyên ji dîn û ji edaya pêdiviyên dînî ye.

Çîroka “Heykel” jî bi vê temayê hatiye nivîsîn. Bi gotinên wek “[d]engê çekan tê ji dûr. Ji pişt çîyan, ji ser zozanan, ji kûrahiya dolan... teyare digurmijin, top dikin gurînî, mîtralyoz gule berdidin, dar û baxçe serûbino dibin, çûk û mar koç dikin, dengê daristan û çolê tê birîn. Zinarên reş ditirsin, bêhna barûtê dimîne li ser pelên daran,”¹¹ tê diyarkirin ka komkujî û tîrsa wê çawa li herêmê belav bûye. Dîsa gotinên wek, “[d]engê qîrînan tê. Wekî gurmîniya ewran erd û esman dihejîne. Diyar e ku keçên azib xwe ji zinaran davêjin. Diyar e ku şûna ku têkevin ber dijmin, mirinê hildibijêrin”¹² nîşan didin ka xwekuştina keçên ciwan çawa û çima qewimîne. Ev gotin jî li ser rewşa dayîkan e ka çawa dergûşên xwe yên qûndaxkirî bi destê xwe kuştine: “Dê hebûn. Dayikên ku çawa berxikên xwe bi sînga xwe ve şidandibûn. Hêstirên wan têne xwar, dayik digirîn. Dayîk wekî lehiyê digirîn. Berxikên wan bînefes in. Rûyên wan ên

10 “Ti kotî menda? Qey vengê to nêvejîno?” (Çem 2005: 41)

11 “Vengê tifangan yeno. Dûrî ra yeno; peyê koyan ra, berziya wareyan ra, xoriniya dolan ra... Teyareyî gurrenê, topî gurrenê, mîtralyozî qerşûnan varnenê (...) Dar û ber beno têsêr û têbin ra. Teyr û tûr, mar û marula bar keno şono. Vengûvaj bi birr û geman birriyeno. Kemera sîyaye tersena, aseyo seretîk qutifiyeno. Boya barûdî nişena bi pelê daran.” (Canşad 2007: 83)

12 “Vengê tewlîliye yeno. Sey biluskî reqeno bi erd û asmên ro. Bellî yo ke kênekeka azebe xo ase ro erzena. Bellî yo ke ver bi dişmenî verarde besnena bi merdene ra.” (Canşad 2007: 84)

paqij çîlspî ne. Lêv û rûyên wan çilmisî ne. Germahiya wan ji wan hatiye stendin, ruh û canê wan ji wan hatine stendin.”¹³

Di çîroka “Pîro Kilmek” de biryareke gundiyan tê dîtîn ku mec-bûrî koçberiyê mane. Dema koçkirinê an jî li herêmên nû yên cihwarbûnê, ger ku leşker xuya bin her kes dê bê dudilî keçên xwe yên azib bikuje. Bi vî awayî gundî li şûna ku namûsa wan pamal bibe keçên xwe dikujin. Di dema rêwîtiya koçkirinê de, ji ber ceribandînan xwe yên bi salan, lehengekî bi navê Bava Kilmek dema fam dike ku wan ji bo kuştinê dibin, vedigere ser girseyê û dibêje:

Ev we dibin mirinê, çî qas ji destê we bê birevin’ û bi sedan kes di nav tevliheviyê de vir û wir de direvin. Koma çekên otomatîk ya ku li ser tûmekî hatiye danîn, agir berdide şênîyê. Lê ji ber ku leşkerê ku wê diemilîne birehm e, serê mekînê ber bi jor ve dide û gule nayê ser însanan. Qumandanên ku vê rewşê dibînin bi derbên hişk ew ji wir dûr dixin û leşkerekî nû datînin ber serê çekên otomatîk. Leşkerê nû serê mekînê ber bi însanan ve vedigerîne û bênavber agir berdide. Tê dîtîn ku 370 kes hatine kuştin. (Çem 2005: 64)

Komkujî, tecawiza keçan, hin leşkerên ku hatine pakkirin bin-geha çîrokê pêk tînin.

2.4 Ferdên civakê yên ku bi şer û derbeyan pelîşî ne

“Xozî Bîyê Zafî” çîroka kesekî ye ku şertên şerî ew guherandiye, jiyana wî serûbin kiriye. Hesenê lehenge çîrokê yekî pir rûşen e. Ji ber şêl û tevgerên xwe yên şên ji hêla derdora xwe ve pir tê hezkirin. Mesela dawet bêyî wî xweş nabin, ew kêfa dîlanan e. Wexta ku Hesen xuya dibe xwediyê dawetê vedigere civatê û mizgîniyê dide. Lê em dibînin ku rewş pir guheriye. Ji ber ku ew û hevalên wî bi sûcê

13 “Dayîkek biye. Dayîke pitê xo çîpa çîp nayo qefesa sêneyî ser. Îstirî piro benê war, dayîke lay û laser bermena. Pitik bênefes o. Rîyo masumo pak sipe yo. Lewî permilîyayê, rî permilîyayo. Tanî ci ra ancîyaya, ruh û can ci ra ancîyayo.” (Canşad 2007: 84)

“alîkariya terorîstan” hatine binçavkirin. 28 roj îşkenceyeke giran dîtine. Piştî van îşkenceyên giran bê mehkeme hatiye rizgarkirin. Lê êdî nîvmirov e. Dêrdê wî ne tenê ev e. Piştî ku gundê wî jî ji hêla leşkeran ve tê şewitandin êdî bê cihûwar dimîne. Ligel vê, kurê wî yê tenê jî tevî têkoşîna azadiyê dibe. Piştî van neyînîyan Hesên ji derdora xwe dûr dikeve, êdî hevalên xwe yê berê jî nas nake. Yek ji wan jî vebêjerê çîrokê ye. Tevî ku zêdetirî deh salan e hev nas dikin, wexta diçe cem Hesên, Hesên wî nas nake. Di sohbeta wan a kurt de ji devê Hesên ev peyv derdikevin: “Birayê min, beraz zêde bûne. Ez çi bêjim? Li derekê ku mirovatî xilas bûye hirç û beraz zêde dibin û bax û bostanan wêran dikin.”¹⁴ Bi van peyvan kesên ku îşkence lê kirine, kesên ku kurê wî jî ber wan terka malbata xwe kiriye û kesên ku gundê wî şewitandine nasnameya ku ji wî û ji civakê re hatiye fesilandin, derdikeve holê.

Çîroka “Wayîrê Zimbêlan” encamên şer û derbeyê ku bandoreke neyînî ya fîzîkî û derûnî li ser takekes kiriye, dike mijara xwe. Beriya ku têkeve girtîgehê tiştên ku ji bo lehengekî bi navê Ehmed tên gotin ev in: “Nizanim çima lê wexta ku min Ehmed didît, çiyayên bilind, biheybet û bi taybetî Akdax dihat bîra min. Mirov dibê qey her dem jê bêhna pincaran, ribêsan û rihanên biyanî dihat.”¹⁵ Li vir du hêmanên sereke hene. Yek ji wan bilindbûna wî ye û ya duduyan jî ew e ku xwedî enerjîyeke jiyane ye û wê enerjîyê jî belavî derdora xwe dike. Tiştêkî balkêş e ku vê enerjîya xwe ya pozîtîf ji hêmanên bajarî nagire, lê ji giyayên wekî ribês û rihan digire ku ev jî bi jiyana çolê re têkildar in. Diyardeya çolî ya xirab nebûye, saf û otantik li vir jî xwe nîşan dide. Taybetîyeke din a Ehmed jî ew e ku xwediyê rewşenbîriyeke kûr e. Sohbeta wî kêfeke mezin dide mirovan û bi eleqeyê mezin guh didin van sohbetan. Meydana Bastilê û êrîşa ser wê, ku wekî meydana şoreşê û malzaroka Fransaya nû tê

14 “Birê, xozî biyê zaf. Ez se vaji? Wexto ke welatêk de insanî qediyay, heş û xozî benê zaf û rezan pelixnenê.” (Lezgîn 2003: 14)

15 “Ez nêzana çi sebeb ra bi, gama ke mi Ehmed diyîni, koyê berzê heybetinî û xaseten zî Koyo Sipî ameynî vîrê mi. Her tim mi vatînî qey boya vaşê koyan; boya ribêsan, boya rihanê yabanî Ehmedî ra yena.” (Lezgîn 2006: 10)

lansekirin, yek ji mijarên van axaftinên germ e. Serfiraziyên Spartakusî ku bi koleyan re êrîş kiriye ser artêşa Romayê, têkoşînên serokê tevgera serbixwe ya Vietnamê Ho Shi Minh, Marks, Lenin û Che Guevara hin ji mijarên wî ne ku li ser axiftiye. Ligel vê, cih dide efsane û tekoşerên Rojhilat û kurdan ên wekî destana Kawayê Asinger, Ristemê Zal, Bedirxan Begê Botan, Şêx Ubeydulayê Nehrî, serhildana Simko, Şêx Seîd, Elîşêr û Zerîfa. Piştî çend rojan, rêveberiya awarte tê îlankirin û mirovan yek bi yek dixin girtîgehê. Yên ku ewil têtin girtin jî kurdên xwedî şîûra siyasî ne. Ehmed jî yek ji van hedefan e. Zêdeyî deh salan li girtîgehê dimîne û tê berdand. Lê yekcar bûye yekî din. Di bin cilên wî de hestiyên wî xuya dibin, li rûyê wî kûrahî çêbûne û simbêlên wî hêdî hêdî spî bûne, bi kurtasî êdî çilmisiye. Ji hêla psîkolojîk ve jî her hilweşiyayî ye. Ehmedê ku beriya têkeve girtîgehê ji ciwanên der û dorê re axaftinên germegerm dikir û îdolê wan bû êdî li civatê xwe dide kuncikekê, bi awayekî bêdeng guhdariya axaftinan dike an jî dikeve nav ramanên ku wî ji wê civatê vediqetînin. Jixwe pir bi ser de naçe dimire.

“Tewî” çîroka lehengekî ye ku ji bajarê Diyarbêkrê ji ber tirsê işkence û mirinê direve û diçe metropoleke nenas. Di nav tenêtiyeke mezin û bedbext de ye. Bi gotinên, “[e]v bajar çî qas mezin bibe jî tenêtiya min ji wî mezintir e.”¹⁶, meziniya tenêtiya xwe derdibire. Lê ji ber îdealên xwe vê êşa tenêtiyê dê bikişîne. Her roj li wê armanca xwe difikire û warê xwe tîne bîra xwe.

3. Têkoşîna azadiyê, daxwaza hilweşandina desthilata zordest û bikerên peywendê

Wekî gelek pisporên edebiyatê nîşan daye, nivîsa edebî, di têkoşînên li hember mêtinkarî, emperyalîzm û rêveberiyên zordest de hêzek e ku divê mirov bala xwe bidê. Ev metnên dîdaktîk alîkarî dikin berxwedana li hember desthilatdariya biyanî û cemaetên hevkar bîn afirandin. Bi gotina Edward Said, dibe ku koledar zexm

16 “No şaristan ende pîl o; ne ser û ne zî bin o. Labelê o çiqas gird bo, ez vana qey tenêtiya mi hema nê şaristanî zî pîlêrî ya.” (Lezgîn 2003: 65)

be û neyê hilweşandin, lê mirov dikare axa xwe di xeyalên xwe de ji wan werbigire. Edebiyat piştî (an jî berê) bidestxistina yekbûna herêmi û siyasî, piştgiriyeke mezin û hesteke millî ya yekitiyê dide mirovan (Jusdanis 1998: 227).

Berçavkirina neheqiyên serdemê û şertan ne ji bo wê yekê ye ku xwendevan bi awayekî xwînsar lê binêre. Ji bo vê yekê, berhem li ser honakeke bicoş û mereqdar ava ne. Lewma dilê xwendevan li hember neheqiyê li hev dikeve û dixwaze perdeya li ser rake. Li hemberî vê pespayeyê bikerên ku tîna hezkirin û pratîkên wan ên jiyanê di nava heman honakê de tîna pêşkêşkirin (Sartre 2005: 72).

Heyranî û hezkirin di cestayê bikerên qehreman û fedakar de dikeve nav berhemên edebî. Ev rehendê honakê bangê e bo têkoşîna azadiyê ye. Nivîskar, digel rewşa ku me li jor qîset kir, bikerên ku dil dîkin vê rewşê biguherînin jî ava dîkin, ku em ê niha hinek jî bala xwe bidin wan.

3.1 Mîta qehremaniye û banga bo têkoşîna azadiyê

Di edebiyatên postkolonyal û berxwedanê de motîfa leheng û takekesê ku serî hildide pir tê bikaranîn. Aimé Césaire ev motîf kiriyê helbest:

Dayik

Lê min xeyala wî kurî kiribû ku wexta diya wî bimire dê çavên wê bigire.

Serhildêr

Min rêya ku kurê min çavên xwe ji taveke din re veke hilbijart

Dayik

...Ax kurê min... mirineke kambax û bêxwîn

Serhildêr

Dayê, mirineke taze û nuwaze.

Dayik

Ji nefreteke zêde

Serhildêr

Ji evîneke zêde.

Dayik

Min bibexşîne, ez ji zincîrên te dixeniqim, xwîn ji min tê bi birînên te.

Serhildêr

Dinya min nabexşîne... li tu derê dinyayê bêjiyekî nehatiye lînckirin, an însanek nehatiye îşkencekirin bêyî ku ez ji bêm kuştin an hetikandin. (nql. Fanon 2007: 91)

Wekî tê dîtîn, feraseta ku tê de mîta qehremanan li kar e, çalakiyekê berz û bilind dinirxîne ku kesekî an civakekê ji bo başiya gel, netewe an jî tevahiya dinyayê xwedana girîngiyeke mezin e. Nave-roka qehremaniyê bi şertên şênber ên dîroka netewî re têkildar e. Reşkirina êrîşkaran, şerkirina ji bo pêşketina jiyana civakî an siyasî an jî çandî, têkoşîna hemberî hêzên kevneperest ên civakê, ev hemû wisa dikin ku mirov ji bo armanc û berjewendiyên civakê bixebite û vî tiştî wekî pirsgirêk û xebata xwe ya sereke qebûl bike. Lê belê ji bo qehremaniyê biryara azad a takekesî, pêngava wî ya çalak esas e, heke na ev bi daxwaza kesekî din nabe (Pospelov 2005: 139). Edebiyatnasên zaza jî wekî encama vê têgihîştina xwe, teşebusî afirandina mîtên bi vî awayî kirine. Di van berhemên angaje de tê xwestin ku xwendevan xwe nêzîkî leheng bibîne, ji bo vê jî serî li amraz û amûrên cihê didin. Di serî de diyardeya fedakariyê û demên mirinê yên qehremanane û dramatîzekirî tên. Di edebiyata cîhanê de mirinên trajîk di van ferasetên edebî de gelek hatin bikaranîn. Lewre, “têkbirina dijmin an jî dijberê çînî, ji esmên daneketiye hembêza gelan; pîrî caran serkeftin bi mirina gernasana û bi qurbandayîna gelan hatiye bidestxistin” (Pospelov 2005: 144).

Çîroka “Gorse”yê bi heman armanca hatiye nivîsîn. Qala jiyana sê ciwanan tê kirin. Ev her sê perwerdekirî ne û xwedî ferhengeke berfireh in. Lê belê, li şûna ku wê perwerdehiya xwe ji bo takekesiya xwe û ji bo bilindkirina standardên jiyana xwe bi kar bînin, ji

bo hişmendî û têkoşîna civakî bi kar tînin. Ev ciwan tevî têkoşîna azadiyê bûne. Li gundê ku diçin guherîneke hişmendî ya pir cidî çêdikin. Gelê ku heya wê çaxê peyvên welat, millet, azadiyê bi lêv nekirine êdî bi wan peyvan diaxivin. Lehengê Sofî Hesên û gundiyan mîna wî berê zarokên xwe nedidan xwendin, lewre ji bo wan xwendin çêbûna wan ciwanan bû ku nimêj nakin, rojî nagirin û ji exlaq dûr in. Lê belê piştî ku Sofî Hesên van her sê ciwanan wekî “jîr û dilpak” dipejirîne, dibêje ku fikra wî guheriye. Navê van her sê ciwanan li zarokên nûçêbûyî dikan. Nav, nasname ye; diyardeya fêhm û feraseta jiyane ye. Ciwan carinan tînin gund û tevî gel dibin. Wexta carekê dîsa bi vî awayî diçin malekê, cara ewil bi Zulfiyê xwendekarê lîseyê rastî hev tînin. Ev her wiha dema rasthatina bi efsaneyê ye. Ji heyecanê nizane çî bike. Êdî di nav efsaneyê de ye. Çend deqeyan li ciwanan dinihêre û dîsa dinihêre. Piştî demekê tînin diçin ku ev ciwan hatine kuştin. Lê belê ev kuştin rê dide ku ev mît bêtir bi pêş ve biçê û belav bibê. Ciwan li cihê ku xwe vedîşêrin tînin tesbîtîkirin. Bi sedan leşker wê derê dorpêç dikan. Piştî dorpêçkirina bi saetan ew her sê ciwan tînin kuştin. Lê ev kuştin yekcar wan dike efsane. Nakokî ew e ku li aliyekî bi sedan leşker, çekên teknolojîk, li aliyê din jî tenê sê kes ku xwediyê çekên sivik in. Têkçûn bi xwe jî di rewşa serkeftin û qehremaniyê de ji hêla nivîskar ve tînin pêşkêşîkirin. Armanc ew e ku xwendevan beralî bibê. Evî û heyraniya ku li hemberî lehengan çêdibe, bi wê armancê ye ku xwendevan xweziya xwe bi wan bîne.

“Bêçare” jî çîrokeke bi heman rengî ye. Lehengê çîrokê beriya ku tevî têkoşîna azadiyê bibê xwedî jiyaneke xweş e. Karekî wî yê baş heye. Xwedî zarok û jinekê ye û bextewar in. Lê belê ew bi xwe sadiqê doza xwe ye û van hemû tiştan li hêlekê dihêle û tevî têkoşînê dibe. Di rojêke şer de hemû hevalên wî tînin kuştin û ew tenê dimîne. Nivîskar teswîra psîkolojîk û madî ya vê demê dike. Naxwaze li vê derê bimire û dixwaze ji bo îdeala xwe li ser vê têkoşînê berdewam be. Wexta li derdora xwe dinihêre tiştêkî nabîne ku bikaribe alîkariya wî bike. Ji bo rizgariyê hêvî ji perperîk, morî û ewran dike. Hêvîkirina ji perperîk û moriyan ji bo nîşandana neçariya wî girîng

e. Ev her du zindiyên zeîf û nazenîn tiştên herî dawî ne ku mirov ji wan alîkariyê bixwaze. Her wiha leheng di nav vê libendêmayîna neçar de dimire.

Di çîroka “Tewî” de lehengên ku hatine efsanekirin û çiyayên ku hatine estetîzekirin hene. Çiya her tim wekî xwe sekinîne û stûyê xwe li ber tu zordariyê xwar nekirine. Di vê rewşê de divê ew jî bişibin çiyayên xwe. Tê dîtin, ji bo ku ev ciwan bişibin van çiyayan xwe dispêrin van çiyayên himbêzvekirî. Ev estetîzebûna çiyê hem bi awayekî fîzîkî hem jî bi awayekî razberî heqîqetêkê îfade dike. Sîstem û hêzên ku ji hêla fîzîkî dikarin ji gelek cihan re zordariyê bikin, ji ber asêyiya çiyayan nikarin bi awayekî rihetî wan têxin bin desthilatdariya xwe. Wexta ku dibêjin me xistiye bin desthilatdariya xwe jî, berevajî qadên din ên ku desthilatdariyê lê dikin, kontrola wan a li ser çiyayan pir sînordar e. Ji vê hêlê ve çiya wekî xwe dimîne û eslê xwe diparêze. Însanên ku li hemberî desthiltan derdikevin vê qadê wekî cihê xwe yê berxwedanê hildibijêrin, lewre çiya ji hêla fîzîkî ve vê derfetê dide. Di heman demê de ev mirov ji hêla parastina eslê çiyê jî bi îdealên xwe re hevalbend in. Ji ber sebebên xuya dibe ku nivîskarên ku di rista “edebiyata berxwedanê” de berheman didin dîmenekî estetîzekirî yê çiyayan didine ber xwendevanên xwe.

Di edebiyata polîtîk de, bi rêya lehengên çîrokî, ji bo afirandina lehengên rasteqîn ên ku dê asiye bavê siyasî bin, tê dîtin ku hemû tîpolojîyên civakê li ber çavan hatine girtin. Bi vê rêbazê berhemên edebî dê bikarin şikleke bidin girseyê. Rola ku ji kesên ji her temenî, ji takekesên her rewşê, ji her zayendê re tê dayîn, hewl dide ku wan serogermo bike. Çîroka “Bostan”ê ji bo zarokan hatiye nivîsîn. Xidir, lehengê çîrokê, ji zarokên biçûk re wekî tîpekî îdeal tê pêşkêşkirin. Xidirê ku ji malbateke gundiyan tê, li gundê xwe dijî û bi tiştên rojane yên gund re mijûl dibe. Lê belê ev malbat xwedî taybetiyên cihê ne jî. Birayê Xidir pirtûkên qedexekirî dixwîne. Lê haya malbatê ji vî tiştî tune ye. Tenê Xidir hay jê heye, lewre baweriya birayê wî pê tê. Rojekê, Xidir şeveqê wexta ku hê roj derneketiye şiyar dibe û diçe ser kaniyê. Lê tam di vê demê de dibîne ku leşker wekî

qefleyên moriyan ber bi gund ve tèn. Lezelez ber bi mal ve diçe û birayê xwe şiyar dike. Birayê wî zû zû radihêje pirtûkên xwe û li baxçe vedişêre. Leşkerên ku tène gund li malê tu pirtûkan nabînin lê belê dîsa ji birayê Xidir dibin û gazî bavê wî dikin ku were qereqolê. Piştê ne ji bavê wan ne ji birayê wan xeberek tê. Hemû malbat perîşan e, lê Xidir li ber xwe dide û nagirî jî. Karê baxçe û heywanan, ê ku debara wan pê dibe, hildide ser milê xwe. Piştî çend mehan, tê bihîstin ku bira û bavê Xidir hatine berdan. Wexta vedigerin malê rastî rewşeke ecêb tèn: Mala wan bi awayekî rêkûpêk li ser piyan maye. Di çîrokê de Xidir nehiştiye ku pirtûkên qedexe bèn dîtin, bi heman bedena xwe ya qels hemû berpirsiyariya malbata xwe hildaye ser milê xwe, wexta ku ev tişt jî kirine tu car bêhêvî nebûye û ev tişt hemû bi şewqeke mezin kirine. Nivîskarê çîrokê lehengê Xidir bi vî awayî wekî îdeal pêşkêşî zarokên kurd dike û rê wan dide ka dê jiyaneke çawa hilgirin ser milên xwe. Ev biker pişt dide wan kesan ku xwediyê hişmendiyêke polîtîk bin li hemberî desthilatdariyê. Di heman demê de bikerek e ku ji zererên desthilatdariyê re bibe asteng û kelem.

3.2 Dema ku nivîskar li cihê dadger rûdine: dîmenê bikerên xayîn

Di edebiyatên wek ya zazakî de, ku tê de qisetên netewî têra xwe hene, bi qasî bikerê qehreman, dîmenê bikerê xayîn jî girîng e. Ev dem pariyek lixwekirina cubeya dadgerî ye ji bo nivîskar. Di çîrok-nûsiya modern a zazakî de kesên ku “nivîskarê dadger” beriya her kesî li ser kursiya bersûc dide rûniştandin, kesên cerdevan in. Peyvên wekî xiyamet, diziya pere, destdirêjiya namûsê layiqê wan in.

Di çîroka “Perşe” ya Roşan Lezgîn de, cerdevan ew kes in ku gundê wan nehatiye şewitandin. Yanê kesên gundê wan hatiye şewitandin û yê nehatiye şewitandin hene. Yên nebûne cerdevan, mecbûrî koçê bûne. Ew xwedî “rûmet” in, lê yên ku bûne cerdevan, koletiya zordestan qebûl kirine. Wesfandina nerênî ne tenê ev e û gelek taybetiyên nerênî layiqê wan tèn dîtin. Di çîrokê de Eyşeya pîr

tevî malbata xwe koçî bajêr kiriye. Ev gotinên ha nîşaneyek in ji bo cerdevananên ku çav berdane namusa xelkê:

Havînan nîvê malbatê diçûn gund. Tenê ev pîrika Eyşe û keçîkek li malê diman. Ez wisa difikirim ku, ji tîrsa wan cerdevanan ev keçîk nedibirin gund. Ev keçîk neviya Eyşeya pîrik e. Keçîk ew qas xweşik e ku wexta çavê kalîkek heştê salî lê dikeve hişê wî jî dikare ji serê wî biçe.¹⁷

Di çîroka “Delale” ya Jêhatî Zengelan de jî heman mijar tê dîtin. Wexta ku birayê Delalê ji bo têkoşîna azadiyê ji malê derdikeve, bavê wê jî diçe rehmêtê û hêdî hêdî bê piştekan dimîne. Kurapê wî Bedoyê cerdevan di bin bandora xweşikî û ciwaniya wê de dimîne û berê dixwest pê re bizewice. Lê belê bi taybetî ji ber ku Bedo cerdevan e Delal naxwaze pê re bizewice û malbata wê ji ber vê bêdiliyê keça xwe nadê. Lê wexta ku Delal tenê dimîne Bedo vê fersendê bi kar tîne û dest bi tacîzê dike. Delal ji kesekî re qala vê rewşê nake. Lê rojekê Bedo dest davêje namûsa Delalê ku li malê tenê ye. Delal qala vî tiştê xirab jî ji kesî re nake. Lê belê meh derbas dibin û ji bedena wê jî tê famkirin ku Delal ducanî ye. Delal mecbûr dimîne ku ji diya xwe û derdora xwe ya nêzîk re qal bike. Bi apê wê re dipeyivin û wê biryarê didin ku mehra wê û ya Bedo bibirin. Lê wexta Bedo qebûl nake, apê wê jî dibêje ku buxtan li kurê wî dikin û ew jî vê zewacê red dike. Keç û diya wê nikarin li gund bimînin û koçî Diyarbêkrê dikin, diçin cem xizmên xwe. Bedo bi hevalemî xwe yê cerdevan re tê Diyarbêkrê û şevêkê di bin sûran de keçîkê dîkujê. Piştî bûyera kuştinê bi riheftî ji wir dûr dikeve. Qet panîk nabe. Lewre ew cerdevan e û dizane ku tu kes tişteki jê napirse.

Di çîroka “Vilaweke” ya Murad Canşad de jî ji wan bikerên bingehî yên tîpêk hene ku di qîset û gotarên netewî de gelek caran têne ber çavan. Emên ezakêş û fedakar, dijminê ku ji bo qirkirina me tê

17 “Hamnanan nîmeyê keyeyê inan şînê dewe. Na pîra Eyşe û yew kêna tena keye de manenê. Ez vana qey tersê qorucîyan ra yo ke nêaftarenê na kêneya xama dewe de bimano. Na kêna torina pîra Eyşe ya. Hende rind a ke ez vana qey kalêko heştaysêrre zî çim bigino piro, belkî xora şiro.” (Lezgîn 2006: 64)

û cerdevanên ji nav me ku me dikujin. Ev her sê jî hene. Guundî û yên ku tevî têkoşîna azadiyê dibin ezakêşî û fedakariyê temsîl dikin; leşkerê ku davêjin ser gund wekî bikerê dijmin ê wêrnaker tê pêşkêşkirin. Muxtarê gund Zeynel jî wekî cerdevanekî tê nîşandan ku xiyaretê li gelê xwe dike. Nivîskar bi taybetî li ser diyardeya xiyaretê disekine. Ji serhildana Şêx Seîd û dîroka kurdan mînanan dide. Ji ber ku çîrok bi şewaza temayûl hatiye nivîsîn, nivîskar bi van gotinan payeya ku divê ji kesên ku xiyaretê dikin re dide, natirse: “Gel û welatê me beriya her tiştî ye. Gel û welatê me namûs û şerefa me ye. Divê her kes vî tiştî bizanibe ku bedela bînamûsî û bêşerefiyê kuştin e.”¹⁸ Her wiha Zeynelê mixtarê gund, ku xiyaret kiriye, bi gotina nivîskar, “bi edaleta şoreşê” tê înfazkirin.

4. Encam

Ji van mînanan û ji vê xwendina hûr jî diyar e ku di çîroknûsên zaza de hin kodên desthilatê li pêşberî me ne. Bi destnîşankirina van kodan, xwendiyên wan metnan ji bilî nivîskariyê barkêşîya mîsyonekê jî girtine ser milê xwe. Bi rihetî dikare bê îfadekirin ku referansên wan ên bingehîn “dîroka netewî” û “rastiya civakî” ne. Nivîskarên ku li dîrokê hûr dibin û tabloyên trajîk ên jiyane nîşanî xwendevan didin, di heman demê de cih didin trajediyên serdemên nêzîk jî û bi vî awayî hewl didin ku xwendevan têxin nav meyleke psîkolojîk. Dikare bê gotin ku çîroknûsên zaza, ji bo bigihîjin armanca îdareya psîkolojîk, vegotin û qisetên xwe bi piranî ji meyla fantastîk dûr dixin û hewl didin ku di xwendevan de hestên rasteqîne şiyar bikin. Wexta hewl didin ku vî rasteqîniyê biafirînin, pesendkirin û redkirinên xwe yê ramanî bi awayekî vekirî derdixin pêş. Formulasyona “çîroknûsiya zazakî ya modern” îro bi van wesfan li pêşberî me ye ku rengê edebiyata berxwedanê dihewîne.

18 “Şarê ma, welatê ma her çiyî ra raver o. Şarê ma, welatê ma namûs û şerefa ma yo. Her kes naye bizano ke, bedelê bînamûsiyê, bedelê bêşerefiye merg o.” (Canşad 2007: 14)

Çavkanî

- Canşad Murad (2007). *Xafilbela*, Stenbol: Vate.
- Çalışlar İzzeddin (2010). *Dersim Raporu*, Stenbol: İletişim.
- Çem Munzur (2005). *Hewnê Newroze*, Stenbol: Vate.
- Doğan Yalçın (2012). *Savrulanlar Dersim*, Stenbol: Kırmızı Kedi.
- Eagleton Terry (2009). *Eleştiri ve İdeoloji*, wer. Savaş Kılıç, Stenbol: İletişim.
- Eagleton Terry (2011). *Edebiyat Kuramı Giriş*, wer. Tuncay Birkan, Stenbol: Ayrıntı.
- Espar J. İhsan (2004). *Beyi Se Bena?*, Stenbol: Vate.
- Fanon Frantz (2007). *Yeryüzünün Lanetlileri*, wer. Şen Süer, Stenbol: Versus.
- Freire Paulo (2010). *Ezilenlerin Pedagojisi*, wer. Erol Özbek, Dilek Hattatoğlu, Stenbol: Ayrıntı.
- Gunduz Deniz (2004). *Hikayeyê Koyê Bîngolî*, Stenbol: Vate.
- Jusdanis Gregory (1998). *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*, wer. Tuncay Birkan, Stenbol: Metis.
- Lezgîn Roşan (2003). *Binê Dara Valêre De*, Stenbol: Vate.
- Lezgîn Roşan (2006). *Halîn*, Stenbol: Komal.
- Loomba Ania (2000). *Kolonyalizm Postkolonyalizm*, wer. Mehmet Küçük, Stenbol: Ayrıntı.
- Memmi Albert (2009). *Sömürgecinin Portresi Sömürgeleştirilenin Portresi*, wer. Şen Süer, Stenbol: Versus.
- Özdel Gizem (2012). “Foucault Bağlamında İktidarın Görünmezliği ve ‘Panoptikon’ ile ‘İktidarın Gözü’ Göstergeleri”, *The Turkish Online Journal of Design, Art and Communication*, Volume 2 Issue, rr. 22–29.
- Pospelov Gennadiy (2005). *Edebiyat Bilimi*, wer. Yılmaz Onay, Stenbol: Evrensel.
- Said Edward (2009). *Entelektüel*, wer. Tuncay Birkan, Stenbol: Ayrıntı.
- Sartre Jean Paul (2005). *Edebiyat Nedir*, wer. Bertan Onaran, Stenbol: Can.
- Uzun Mehmed (2005). *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*, Stenbol: İthaki.
- Zengelan Jêhatî (2007). *Gorse*, Stenbol: Vate.